

Lokman Polat û Fîlozof Fehmî

îbrahîm seydo aydogan

Romana Lokman Polat ya bi navê *Fîlozof* li ser hin agahiyên dîroka Kurdan û bi taybetî jî li ser rêxistin û şexsiyetên wan yên vê sedsala dawîn, heta sala çapkirina romanê (2000), hatiye nivîsandin. Nivîskêr, ji vegotina bûyeran û rewşan bêtir, xwastiye fikir û nirxandinên xwe yên li ser bûyer û rêxistin û şexsiyetên dîroka tevgerên kurdistanî bîne zimên û vê yekê jî bi rêya romanê dîke.

Bûyerên romanê yên ku di nava heftê û pênc salên sedsala bîstan yên dawîn de diçin û tên, li dora şexsiyetekî kurd digerin ku bi xwe di dîroka serhildanên kurdistanî de di wextê xwe de roleke girîng lîstîye. Roman, ji bo baştir fahmkirina serhildana Şex Seîd û tevgerên kurdistanî yên heta dema me û gelek şexsiyetên dîrokî, di çarçoweya vî lehengê de hin agahiyên nivîskêr dide. Lokman Polat, di vegotina vê dîroka ku ji bo Kurdan tije êş û kerb e de gelekî ji dil tev geriyaye. Mirov dikare di hemû nirxandinên wî yên civakî, siyasî û edebî de vê dilsoziya wî bibîne, lê belê bikaranîna van helwêstan ya di romanê de û, jê biwêdetir, awayê bikaranîna wan ji bo vê romana ku em ê behsa wê bikin dibin pirsgirêk.

Lehengê romanê ku nivîskar navê wî geh dîke “Fehmiyê Bilalê Licî”, geh “Fehmiyê Licî”, geh jî “Fehmiyê Bilal” û bi dû re jî dîke “Fîlozof Fehmî” û dawîya dawîn jî dîke “Fîlozof”, di dema serhildanê de ji Şex Seîdî re katibiyê dîke, bi dû re jî di *Xoybûnê* de roleke aktîf dilîze û heta dawîya serhildana Agiriyê û belavbûna rêxistinê jî xebatên xwe yên siyasî didomîne. Di romanê de Fehmiyê Bilalê Licî piştî mirina xwe derbasî bihiştê dibe û li wira li gellek şexsiyetên dîrokî yên navdar rast tê. Bi destûreke Xwedê ya taybetî ve carinan vedigere welatê xwe û dikeve hişê serok û rêberên Kurdan û rêyê bi ber wan ve dixê. Bi bûyera xwe ve piçekî surrealîst diyar bibe jî, ev surrealîstî li derdora kesayetiyê rast hatiye avakirin û ji ber ku li hember serok û rêberên Kurdan ku di romanê de behsa wan dibe pêşderazîbûnek heye, rexneya me jî dê, di ber nirxandina tevna romanê re, bi taybetî li ser vê mijara rastbûna kesayetiyên raweste. Lewre roman bi qelesa Lokman Polatî ve weke dadgehekê hatiye bikaranîn ku nivîskar tê de hukmê xwe dide û cezayan li herkesî dibirre.

1.

Roman bi gotina lîstikeke cirîdê a li Lîceyê dest pê dîke û ji nişka ve beyî ku behsa vê lîstikê bibe, derbasî danasîna zilamekî dibe ku navê wî Eliyê Hewro ye. Eliyê Hewroyê ku em nizanin bê bi çî awayî vê lîstika cirîdê kar dîke û ji mîrê Lîceyê “*goma pey Lîceyê û dehla çiyayê Şîro*” (r.4) wek diyariya serkevtinê distîne, ku bi xwe tîkîliya van bûyeran bi romanê re nîne, zilamekî zewîcî ye û bavê du lawikan e. Ji ber ku roman li ser Fehmiyê Bilalê Licî ye, Hewro û hemû agahiyên li ser wî, lîstika cirîdê jî di nav de, di romanê de wek zêdehiyan dixuyên.

Agahiyên li ser Eliyê Hewro di rûpelên din de jî didomin:

Ji bo ku keçeke Eliyê Hewro çêbibe, zarokeke din çêdikin lê ew jî kurik dibe û ev kurik bi dû re dimire. Eliyê Hewro li bajêr dil dide jinebiyekê jî (r.5) û piştî ku hevalê wî Heqî Beg diçe jê re dixwaze, wê jî li xwe mahr dîke. Kurek ji vê jina duyem jî jê re çêdibe. Sê birayên Eliyê Hewro yên din hene. Yek ji wan azîb e. Birayekî Eliyê Hewro li ser nakokîya erd ji alî Xincisiyan ve tê kuştin, birayên wî yên din jî diçin yekî ji dijminên xwe dikuşin. (r.6)

Heta vê deverê, mirov dibêje qey serlehengê romanê Eliyê Hewro ye.

Piştî vê hevokê paragrafeke ecêb tê:

“*Dostaniya Eliyê Hewro û Heqî Begê bi dilxweşî dom dîke. Fehmiyê Bilal yê Licî mirovekî xwenda ye û bi Heqî Begê û bi Eliyê Hewro re dostaniyeke baş datîne. Fehmiyê Bilal çend car Heqî Begê û Eliyê Hewro bi xwe re dibe bajarê Amedê û li wir wan bi malbata Cemîl Paşa re –ku malbateke xanedan û arîstokratên Amedê ne- dide danasîn. Têkiliyên wan û yên mala Cemîl Paşa bi pêşte diçe. Mala Cemîl Paşa li Amedê şaxa rêxistina Azadiya Kurd damezrandine. Fehmiyê Bilal, Heqî Beg û Eliyê Hewro, hersê jî dibin endamên rêxistina Azadiya Kurd.*” (r.7)

Mirov nikare di romanekê de weha bi lez behsa bûyeran bike û ji bûyereke derbasî bûyereke din bibe! Û tew gava ku lehengên bûyerên yekem û yên duyem ne yek bin, hingê pirsgirêk mezintir dibe.

Hemû bûyerên berî vê paragrafê li dora Eliyê Hewro digerin û ewqasî bi kîtekitên belasebeb hatine behskirin ku gava ku mirov ji nişka ve hevoka “*Fehmiyê Bîlal yê Licî mirovekî xwenda ye...*” dibîne, mirov disekine û li ber dikeve ku di vê romanê de hê di sê rûpelên serî de bûyer tev li hev bûne. Ji ber ku di sêrî de behsa navên herdu jinên Eliyê Hewro jî (Eyşo û Lutfiye), behsa navên du zarokên jina ewil (Xalit û Cindî) û navê kurê jina duyem (Xelîl) jî tîndayin; bi dû re jî behsa sê birayên wî tevî azîbbûna yekî û navên hersêyan (Avdîla, Amer, Osman) tê kirin. Bi dû re meseleya wan ya kuştina birayekî û hilanîna heyfa wî... Yanî, rewş tê amadekirin ku ev kes bibin serleheng, lê belê ne weha ye. Ji nişka ve romannivîs dev ji wan berdide. Di 163 rûpelên romanê de piştî vî beşî bi tenê carekê di hevokekê de behsa kurê wî yê ku navê wî Xalid e derbas dibe.

“heke tiştêk bi min bê, waye kurê min yê mezin Xalit heye, ew ê we xwedî bike, ew dikare erd cot bike, dikare çandinî bike.” (r.18)

Lê em yekî jî ji zarokên wî nabînin û nas nakin. Berî wê bi rûpelekê jî di nav behskirina serhildanê de tê gotin ku Eliyê Hewro tevî birayên xwe tev li leşkerên Şêx Seîd bûye. (r.17). Eliyê Hewro di şer de birîndar dikeve û ji aliyê leşkerên kurd ve tê xelaskirin. Yê ku ew li piştî xwe kiriye û ji bajêr derxistiye birayê wî Amer e. (r.22) Bi dû re, ji ber wê birîne dimire. (r.23)

Wekî din nema behsa birayên wî dibe. Jê pê ve behsa vê malbatê û wan navên zarokên wî û jinên wî jî nabe.

Eliyê Hewro wek hevalê Fehmiyê Bîlal hatiye nîşandayin, lê behsa hevaltiyeke di navbera wan de nehatiye kirin. Bi tenê em dizanin ku bi hev re tev li rêxistinê bûne. (r.7)

Eliyê Hewro û hemû malbata wî û bûyerên li dora wan tu bandorê jî li ser bûyeran û lehengê sereke yê romanê nahêlin. Hingê ji bo çî hatine behskirin, mirov fahm nake. Lê di hin berhemen wî yên din de, mirov li jînenîgariya nivîskê rast tê û hê nû fahm dike. Kalîkê Lokman Polat jî (wî jî sê bira hene) yek ji şehîdên serhildana Şêx Seîd e û gava ew şehîd dikeve jî bavê wî hê zaroka pêçekê bûye, ji lewra dibe ku wî jî xwastibe bi vê minasebetê behsa wan jî bike. Lê romannivîs hê di serê romana xwe de hemû berhevok û agahiyên xwe yên di dest de xerc kirine û bûyer bi vî awayê xêşimiyê tev li hev bûne.

Lokman Polat di 23 rûpelên serî de, amadekirina serhildanê û hemû pêvajoyên tîkçûyina wê jî di nav de, behsa hemû agahiyên xwe yên di derheqa serhildana Şêx Seîd de dike. Di nav re hingî ewqas navên kesên ku tîkîliya wan bi vê serhildanê re heye dide, mirov dibêje qey ne roman, lê rojnameyekê an jî lêkolînekê dixwîne. Lê bi xwe nûçeyên rojnameyan û lêkolînen dîrokî jî weha beyî ku mirov behsa detayan bike û beyî ku tîkîliya bûyeran û kesan bide, nayên nivîsandin.

Nav û kes û bûyerên ku tîkîliya wan bi naveroka romanê re nînin, mirov nikare weha bi serbestî bê sînor behsa wan bike. Her nav û bûyera ku mirov behs kir, divê di romanê de aktîf be. Meseleya di nav Xalid Begê Cibrî û Hecî Mustafa Begê, bi temamî meseleyeke weha ye ku mirov fahm nake bê çima ketiye nava vê pirtûkê. Tu tîkîliya Xalid Begê Cibrî bi romanê re nîne. Bi tenê tê behskirin ku serok ew e û piştî ku tê girtin, Şêx Seîd dibe serok. (r.11) Hingê behskirina nivîsandina nameya wî ya ji Hecî Mustafa Begê re, tevî naveroka nameyê û bûyerên piştî wê, ji bo çî ew qasî bi pêş de hatine derxistin?! Ji ber ku piştî wê di tu deverên romanê de behsa van kesan û wê nameyê nabe. Divê mirov di vira de ji xwe bipirse: Roman an dîrok? Nêyta nivîskêr kîjan ji van e? Heke nêyta wî nivîsandina romanekê be, hingê, di vê romanê de gelek zêdehî hene. Xeteriya bikaranîna bûyerên dîrokê di romanên de bi rastî jî hassasiyeteke mezin dixwaze.

Herweha di beşê duyem de bi awayekî weha behsa kovarên ku Kurdan di serê sedsala bîstan de derdixistin hatiye kirin (r.9) û bûyerên pêvajoya serhildanê û bidawîbûna wê bi şewazeke ewqasî dûrî romanê hatiye vegotin ku mirov êdî ji xwe re dibêje “ev ne roman e ku ez dixwînim.” Ji ber ku ew beş bi temamî dirûvê lêkolînan dide. Mirov dikare çend pirsên din jî ji vê romanê bike.

Ji bilî vê xalê, mirov dikare bipirse ka gelo navên hemû şêx û begên êşîretan çima ketine vê pirtûkê? Bersiv nîne, lewre, nivîskar hema behsa wan dike û derbas dibe.

Çawa behsa Eliyê Hewro di romanê de wek zêdeyî dixuye, beşê li ser Hesên Keya jî, bi serê xwe bûyereke balkêş be jî, tu alîkariyê bi romanê nake. Bûyerên romanê û lehengên wê bi awayekî ecêb tev li hev bûne ku mirov nema dizane bê kî lehengê romanê ye û kî di romanê re wek tîp û

kesayetiyên fon hatine bikaranîn. Lokman Polat çî li ser wê demê bi dest xistibe û zanibe, beyî ku bala xwe baş bide romannivîsiyê, giş gotine.

Belê, nivîskêr hemû agahiyên li ser dema ku bûyer tê de derbas dibin bi dest xistine, lê belê di hin agahiyên dîrokî de, heke nezelaî xuya bibe, dê şaştegihiştinê jî bi xwe re bîne. Agahiyên kêmhîştî yên li ser Xoybûnê, ku di eslê xwe de ne pêwîst in, bi xwe re probleman jî tînin; lewra bi awayekî weha hatiye behskirin ku mirov dibêje qey Celadet Bedirxan ji ber nakokiyên bi malbata Cemîl Paşa re dev ji siyasetê berdaye.

“paşê di nav mala Bedirxaniyan de û mala Cemîlpaşa de nakokî derketin.... munaqaşayên fikrî dest pê kir... welhasil Kurdan bi hevûdu nedikir. Ji hev re astengiyan derdixistin... Kurd ji hev perçe dibûn. Mala Bedirxaniyan û mala Cemîlpaşa ji hev cuda bûbûn. Wan li hevdu rexne digirt. Demek şûn de mala Bedirxaniyan dev ji siyasetê berdan.” (r.37). (Ev hemû yek paragraf e).

Dibe ku ev bûyer rast jî bin, ew ne mijara me ye, lê belê di romanekê de bikaranîna wê şêwazê mirov ji wêjeyê bi dûr dixê. Dîsa di vî beşê de ewqasî nav hatine dayin ku mirov bi temamî ji romanê bi dûr dikeve û dikeve nava dîrokê. Lê ji ber ku bûyer û şexsiyetên dîrokî jî bi tenê bi navan hatine behskirin, mirov digel romanê, ji dîrokê jî bêpar dimîne.

Piştî ku li Tirkiyeyê efûya giştî derdikeve, Fehmiyê Bîlalê ku piştî têkçûyina serhildanê daketibû bin xetê û tev li *Xoybûnê* bûbû, vedigere bakurê Kurdistanê. Ji wira jî sirgûnî Ispartayê dibe. Herdu kurên wî jî para xwe ji xezeba dijminên Kurdan distînin. (r.39)

Em hê nû di vira de hîn dibin ku du kurên wî hene. Lê di romana ku xwedêgiravî biyografîk an jî dîrokî ye de ji bilî wê paragrafa ku behsa van herdu bûyeran dike, ne behsa sirgûna wî û ne jî behsa herdu kurên wî dibe.

Piştî ku “mecbûrî îskan” radibe, Fehmiyê Bîlalê dîsa vedigere welêt û li Diyarbekirê di sala 1967’an de diçe rehmetê.

Heta wê derê hê me Fehmiyê Bîlalê ku serlehengê romanê ye ji bilî agahîya li ser tevlêbûyina wî ya serhildanê û du dialogên wî yên bi Şêx Seîd re, nas nekiriye. Bi tenê em dizanin ku di siyaseta kurdî de gelekî dilsoz e û gelekî xebitiye, (an jî bi kurtî agahiyeke bi vî rengî tê dayin), bi kurdî çîrokan dinivîsîne, ji bilî kurdî û tirkî, bi fransî jî dizane û wergeran ji La Fontaine dike (ev jî bi tenê weke agahî hatine gotin). Gava dadikeve başûr, li wira dersên zimên dide zarokên Kurdan. Le ev hemû xuxûsiyet, nivîskariya wî jî di nav de, bi xwe jî di romanê de nehatine bikaranîn. Bi tenê behsa wan hatiye kirin û di dawiya romanê de ji ber van xuxûsiyetan Ahmedê Xanî ji wî re dibêje *“tu jî li vir li cem me, di nav bexçeyê edebiyatê de bimîne.”* (r.163) Lê mîna xuxûsiyetên pasîv hatine hiştin û jê pê ve Lokman Polat giringî nedaye van xuxûsiyetên ku di naskirina Fehmiyê Bîlalê Licî de karîbû bibûna alîgirên xurt ji romanê re. Lê ji ber ku Lokman Polat hûnandina van rastiyan di cih de bi kar neaniye, ew ji erkên wan bi dûr xistine; lê belê heta ku ji wî hatiye jî xwastiye behsa nivîskariya wî bike û ev xwasteka xwe ewqasî eşkere kiriye ku mirov nikare tahma vegotina romanekê tê de bibîne.

Lokman Polat di beşê heftan de, behsa pirtûkên ku wê demê hatine çapkirin dike û piştî ku yek bi yek navên wan dide, dikeve nixandina pirtûkeke Fehmiyê Bîlalî û weha behs dike:

“Edîp û fîlozofê kurd Fehmiyê Bîlal pirtûkeke gelekî girîng, berhemeke edebî jî amade kiribû. Navê berhema wî Giliya Daran bû. Di vê berhema edebî de 12 çîrok hebû. Naverok û temaya çîroka Giliya Daran ev bû: (...)” û dikeve behsa naveroka wê çîroka ku navê wê hatiye dayin. (r.34)

Bi dû re jî weha dibêje: *“Fehmiyê Bîlal di berhema xwe ya edebî de, mahneya her çîrokekê bi helbesteke mahnegirîng ve dide hûnandin. Ew di çîrokên xwe yên balkêş de dide xuyakirin ku; dijminê Kurdan Kurd bi xwe ne.”*

Piştî van hevokan, romannivîs nixandînan xwe didomîne:

“Haramzadên kurd, xaînên kurd her tim hebûne. Lê mêrxas û egîdên wan jî hebûne. Ji xwe cîhê ku xaîn hebin, qehreman jî hene. Di serhildanên Kurdan de qehremaniyên gelekî mezin hatin kirin. Mêrxas û egîden bi nav û deng derketin...”

Rast e; ev hemû tiştên ku têne behskirin rastiyên Kurdan in. Kek Lokman jî, ji ber ku dilê wî gelekî ji ber êşiyaye, xwastiye hemû rewşa Kurdan û kar û xebatên wan yê serê sedsala bîstan, teva hemû mîrxasî, egîdî û xayintiyên wan, bînivîsîne. Lê ev yek bi xwe, bûye sebaba bidûrketina ji romannivîsînê jî. Ji bo vî karî, ne mecbûr bû ku romanek binivîsandaya. Ji bo awayê ku ew bi kar tîne, formine nivîsandinê yê din hene.

Mirov tédigihêje ku Lokman Polat di derheqê Fehmiyê Bîlal û serhildana Şêx Seîd de gelek agahî bi dest xistine, lê ji bîr kiriye ku romanekê dinivîsîne û xwastiye hema hemû agahiyên di dest de û van hemû bûyerên ji serhildanê heta bi mirina Fehmiyê Bîlalê Licî, di 42 rûpelan de bide.

42 sal di 42 rûpelan de! Kesek nikare vêya bike.

Piştî rûpela 42'an, weha dest bi beşê 9'an dike ku mirov şaş bibe:

“Xwendevanên hêja!

Hetanî vir min qala serpehatiya edîp, zana û ronakbîrê kurd, katibê Şêx Seîde nemir, fîlozof û welatparêzê mezin, Fehmiyê Bîlal kir. Ev tiştên ku min behs kire hemû jî tiştên rast yê dîrokî bûn.

Ji niha û pê ve tiştên ku ez dê behs bikim, tiştên xeyalî ne. ...” (r.43)

Mirov dibêje qey hunerê nivîsandin û vegotina romanê hê nû hatiye peydakirin û Lokman Polat jî yekem romannivîsê kurd e. Lewre, xwendevanê ku romanê dixwîne paşxaneya wî hunerî jî kêr zêde nas dike. Ji ber wê, agahiyên bi vî rengî û diyaloga bi xwendevanan re ya bi vî awayî, bi rastî jî wê baweriyê bi mirov re çêdike ku nivîskar xwendevanên xwe dixê şûna ehmaqan.

Piştî vê daxuyaniya ecêb êdî behsa dewama berhema xwe dike û dibêje bê ew ê romana wî li gora kîjan rêkê biherike. Çima weha kiriye, mirov fahm nake.

Hin hêlên vê romanê yê din jî hene ku nayên fahmkirin. Gava mirov bixwaze lehengê romanê nas bike, pirsgerêkek derdikeve pêşîya wî: Nivîskar ji Fehmiyê Bîlal re dibêje “Fîlozof”, lê tu felsefe û tu fîlozof di vê romanê de tune. Bi tenê berî mirina wî, ji bo ku têkîliya wî ya bi felsefeyê re bête danîn, bi sê hevokên li pey hev weha tê gotin:

“Di medreseyan olî de bi kurdî dersa felsefeyê, mantiqê û astronomiyê dide. (...) Şêx Melîk bi wasîteya wî xwendin û hînbûna edebiyat û felsefeya rojavayê dibe.” (r.41)

Ma mirov weha dibe Fîlozof? Nivîskar lehengê xwe bi çî awayî dike fîlozof, nayê fahmkirin.

2.

Di beşê din de ku nivîskêr ji serî de hayê me jê çêkiriye, yanî em dizanin ku « xeyalî » ye, Fehmiyê Bîlal diçe cennetê û li wira piştî dialogueke ecêb ya bi Xwedê re icazetê distîne ku vegere welatê xwe û “*têkeve mêjiyê serokên Kurdan*” û rê bi ber wan bixe. (r.43)

Lokman Polat, di vira de jî xwendevanên xwe gelekî ecêb dihêle. Sîrf ji bo ku di romana xwe de behsa Saîd Elçî û Dr Şivan (Saîd Kirimizitoprak) bike, ji sala 2000'î (ji ber ku berî wê di rûpela 52'an de behsa bûyera şewitandina Lîceyê dibe) diçe sala 1968'an û Fehmiyê Bîlal dixê mejiyê Saîd Elçî. Di vira de Lokman Polat peyveke ecêbtir bi Fehmiyê Bîlal dide gotin :

“Bi kurdên başûr piştî nayê girêdan. Destê kî di cêva kî de ye, diyar nîn e. Têkîliyên gelek serbazên pêşmargeyan bi Mîta tirkan re heye.” (r.54)

Lokman Polat di heman paragrafê de weha dibêje:

“Dr. Şivan çav berdabû serokatiyê û dixwast ew bibe serok... digot: Seîd Elçî riziya, miriya, nikare serokatiyê bike.” (r.54)

Mirov di romanê de nikare nirxandineke weha bike! Tew gava ku têkîliya mijara Dr. Şivan û Saîd Elçî bi romanê re tunebe, mirov qet nikare! Carina nem kesên ku wêjeyê ji bo ixtirasên xwe yê şexsî û siyasî bi bikar tînin rexne dikin, lê belê Lokman Polat di vê romanê de êdî ji adeta heyî jî derxistiye.

Fehmiyê Bîlal, ji wira jî diçe sala 1970'î. Navê DDKO û PDK-T'yê dide û derbas dibe. Di rûpela 55'an de bi zimanekî ecêb hêzên kurdistanî rexne dike û piştî wê jî pênc rûpelan dide behskirina

çîrokeke gelêrî ku mirov êdî nema dizane bê çi dixwîne. Yanî, ev pirtûk bi temamî şibiyaye peyvên ku ji devê zilamekî serxweş derdikevin û mirov nizane bê kîjan bûyer ji bo çi hatiye gotin.

Di rexneya hêzên siyasî yê Kurdan de hin hevokên Lokman Polat yê ecêb hene ku bi zimanekî dûrî edebiyatê hatine nivîsîn.

“Pevçûyina siyasî ya di nav hêzan de, rûn li nanê dijminê dagirker dikir. Ji xwe hinek pêşevanên rêxistinê ehlê vî karî nebûn... yek jê axa bû lê bûbû serokê rêxistineke ku ji xwe re digot “em rêxistineke marksîst in”... yek jê gundî bû, digot “em dê partiya proletaryayê pêk bînin”, yek jê çepîtiyeke tûj dikir lê di binî de jî bazirganî dikir... yek jê bi kurdî nizanibû, dixwast siyaseteke kurd û kurdistanî pêk bîne, ji wan serokan û sekreteran hinek kes paşê fêrî kurdî bûn, yek jê qet fêrî kurdî jî nebû.” (r.55 û 56)

Ev kes hemû kî ne, ew yekê ku fêrî kurdî nebû kî ye? Em di vê romanê de wan kesan qet nabînin û nizanin! Hingê ji bo çi behsa wan dibe? Mirov dibêje qey Lokman Polat behsa biranînên xwe ji me re dike.

Di beşê 12’an de Lokman Polat dikeve behsa nîqaşên li ser edebiyata kurdî û nîrxandinên xwe radigihîne xwendevanan.

“... hinek dibêjin: /Edebiyata kurdî tune./ Çima?/ Kurd negihîştine wê sewiyeyê ku berhemên edebî biafirînin./ Romana kurdî tune./ Çima?/ Kurd nizanin romanên binivîsînin./ Novela kurdî tune/... Analîza bi kurdî tune... Wergervanên kurd tune ne./ Çima?/ Kurd ziman nizanin. Nikarin pirtûkan wergerînin.

“Kurdekî edebiyatêz dev ji karê xwe yê bazirganiyê berdide û tenê li ser karê edebî dixebite, ji edebiyata kurdî re gelek xizmet dike û bi kurdî kovara edebî derdixe û çîrokên kurdî dinivîse. Çîrokên baş dinivîse, yê modern dinivîse. Hinek kurdên hesûd jî ji bo wî dibêjin: “ew çîrokên baş û modern nanivîse, didize.” Romannivîsekî kurd cehd dide ku edebiyata kurdî dewlemend bike û romana kurdî ji qelsiyê xelas bike. Hinek hesûd dibêjin: “wî wan romanên nenivîsandiye, diziyê!...”

“De were û vê kelekê di vê avê de derbas bike...” (r.64)

Behsa kê dike, di romanê de ne diyar e; lê ji bo van fikir û nîrxandinan, bi tenê em karin dubare bikin: pêwîst nedibû ku romanek binivîsandaya! Mirov fahm dike ku çîroknivîsê ku behsa wî dibe ya ew bi xwe ye yan jî Firat Cewerî ye û romannivîsê ku behsa wî dibe jî Mehmed Uzun e.

Bi dû re ruhê Fehmiyê Bîlal diçe dikeve serê Evdoyê Cergoyê (r.65) ku bi hemû dialog û bûyerên xwe ve Abdullah Ocalan e. Fehmî bi wî re dipeyive û wî tawanbar dike. Bi dû re gelek navên din dikevin romanê. Heta bi Ahmedê Zirkoyê (r.72) ku awûqatê wî ye û bi xwe Ahmet Zekî Okçûoğlu ye, diyalogên ku di nav wan de derbas bûne ku Ahmet Zekî di nivîsên xwe yê kovara Serbestiyê de berî çapkirina vê romanê nivîsandibûn, tevgerên Evdoyê Cergo yê li dadgehê, daxwaza wî ya lêborîne û ramûsandina wî ya ala tirkî... (r.108)

“Ahmedê Zirko dixwast ku ew parastineke siyasî û netewî bike û heqîqeta doza kurd li dinyayê belav bike... Lê wî wek gotina awûqat nekir... got: “ez dê parastina xwe di çarçeweya ku dewletê û navendiya ajotbarê serokwezîriyê çixiz kiriye de bikim. Tu kes bila ji min hêviya parastineke din neke. Ez ji we jî dixwazim ku hûn di vê çarçeweyê de parastinê bikin.” Avukatê wî qebûl nekir û xwe ji dawayê kişand.” (r.72 û 73)

Erê, gotiye ku xeyalî ye, lê belê roman êdî iddiaên mezin dike û barekî zêde giran datîne ser milê wêjeyê.

Lokman Polat van dialogan ji ku dizane? Bersiv hêsan e. Ahmet Zekî Okçuoğlu’yê ku awûqatê Abdullah Ocalan bû weha nivîsandiye û gava carekê çû Swêde qey li wira ji derdora xwe re gotiye. Ahmet Zekî bi xwe, di siyaseta kurdî de şexsiyeteke hurmetkar û hêja ye. Nivîskarê vê nivîsê bi dilsoziya wî baş dizane. Hemû diyalogên ku wî li ser Abdullah Ocalan ragihandine derdora xwe û di nivîsên xwe de gotine, dibe ku rast bin jî; lê ev ne karê romanê ye. Ji ber ku Abdullah Ocalan ne kesekî xeyalî ye, mirov nikare diyalogên weha ji devê wî bide nivîsandin. Mirov nikare bi ragihandinên însanekî bûyereke dîrokî ku gelekî giring û hassas e, binîrxîne û mîna ku mirov şahidê wê bûyerê ye binivîsîne. Hingê divê kesên alîgirê Ocalan jî di romanên xwe de Ahmet Zekî wek “xayinekî” an jî “ajaneke MITê” nîşan bidin û ji devê wî tiştên ecêb binivîsînin. Ji ber ku PKK’yan jî li ser Ahmet

Zekî weha digot. Yekî alîgirê Ocalan jî dikare romanekê binivîse û nîşan bide ku Ahmet Zekî li avahîya MIT'ê dixebite û derdikeve operasyonan. Hingê, gelo Lokman Polat dê çi bike? Em wê nizanin, lê em dizanin ku divê ew jî were rexnekirin.

Na! Tu roman nikare vêya rake! Me tim gotiye. "Edebiyat di şexsiyeta nivîskarên kurd de bûye xulama siyasetê."

Di romanê de weha behsa Evdoyê Cergo dike: "*Dema berê heyşteyî de çûbû ketibû hundirê mejiyê wî. Lê wan bi hevûdu nekiribû. Ew mirovekî asabî bû, û pir jî pragmatîk bû...*" (r.65)

"*Wî di wê demê de pirtûka "Bexçeyên Ronahiyê" dixwendin. Di wê pirtûkê de behsa jîyan û tekoşîn û felsefeya Manî dihate kirin.*" (r.70)

"*Pişti demekê Evdoyê Cergo ji rojhilata navîn derket... Paşê çû di welatê Sezar de bi cih û war bû... Sîxurên cîhanê ji bo leyistikan bînin serê wî li derûdora wî cirît davêtin. Paşê leyistikek hanîn serê wî, wî ji wir derxistin û birin di welatê reşikan de bi komployê wî dane girtin.*" (r.70)

Bi dû re jî weha dibêje:

"*Kurd layiqê dewletê nebûn, Xalanê wî tenê layiqê dewletê ne.*" (r.76)

Abdullah Ocalan gava ku hatibû girtin, gotibû "diya min jî tirk e." Lokman Polat peyvê diavêje wê hevoka wî. Lê yên ku bi vê meseleyê nizanibin, dê vê hevokê fahm nekin. Hingê nivîskar vê romana xwe bi tenê ji bo kesên ku hayê wan ji berê de ji bûyerê heye nivîsandiyê. Heke weha be û tu agahiyên nuh li ser vê bûyerê li cem wî tunebe, Polat ji bo çi ji nû ve behsa vê bûyerê dike, mirov wê jî fahm nake.

Pişti wê dîsa li ser Ocalan bi Fehmiyê Bîlal weha dide gotin:

"*mêrik ketibû tirsra ruhê xwe.*" (r.83)

Weke ku me got, Fehmî diçe bihuştê û li wira bi gellek kesan re rûdinê. Hz İbrahim jî di sohbeta xwe ya bi Fehmî re de li ser Abdullah Ocalan weha dibêje:

"*sî hezar kurd... hinekên wan di mehên zivistanê de... bi talîmata hemşeriyê min Avdoyê Bizdo ve hatin kuştin.*" (r.132)

Bi dû re jî dibêje:

"*xelkê Ruhayê tirsonek nînin, lê ew tirsonek derket. Divê... ala tirkan ya bi xwîn maçî nekirana.*" (r.132)

Hezretî İbrahim jî weke kurdekî dipeyive, lê weke kurdekî şoreşger!

Li ser şexsiyeten dîrokî, mirov nikare mîna agahiyên rojnameyan û sohbetên nav hevalan binivîsîne. Romannivîsek tucarî nikare bi vî zimanî û bi vê şewazê binivîsîne. Heman şewazê û heman zimanî di vegotina bûyera Saîd Elçî û Dr. Şivan de jî bi kar tîne.

Di romanên de xeteriya vegotina bûyerên dîrokî di vira de mîna keke gelekî xurt dide destê me. Herçî bûyerên dîrokî ne, heta ku wext di ser wan re derbas nebin û hertişt baş zelal nebin, mirov nikare di romanên de behsa wan bike. Serhildana Şêx Seîd baş e, tiştêkî veşartî tê de nemaye ku mirov tê de xeletiyên bike, an jî ihtimala xeletiyên tê de kêm e; lê ji bo vegotina van bîst-sîh salên dawîn, ji bo romannivîskariyê, divê mirov baş bifikire û ya çêtir ew e ku qet têkilî wan jî nebe. Tew êdî hemû romannivîs pê dizanin ku mirov nikare ji devê kesên dîrokî peyvên nerast yên li ser bûyer û kesayetiyên dîrokî bide. Ji ber ku bi vê peyvê û peyva "*bawerî bi kurdên başûr nayê... têkilîya gelek serbazên pêşmergeyan bi Mîta tirkan re heye*" barekî giran dikeve ser milê Fehmiyê Bîlal û Lokman Polat. Gava ku tu navê serokê tevgerê Kurdan bikî « Bizdo » jî, barê te girantir dibe. Tu carî mîna ku mirov di lehengên xeyalî de dike, nikare bi lehengên rastîn jî bilîze û wan li gora keyfa xwe bide peyivandin. Meseleya kesayetiyên rastîn di vira de dest pê dike. Aha ji ber vêya roman nikare debarî lehengê rastîn bike. Herkes dizane, ew ji bo vegotina rewşên civakî û ji bo bikaranîna tîpan, gelekî baş in; lê wek leheng an jî serleheng, sînorê dafînî ser fantazî û tevna romanê û ji ber rasteqîniya bûyer û dîialogan, xeternakiyê jî berra nava romanê didin. Di vê romanê de, ji bilî Fehmiyê Bîlal, di vegotina Şêx Seîd de mirov vêya bi awayekî xurttir dikare bibîne. Şêx Seîd wek zilamekî neçar, qels û nezan xuya bûye.

3.

Fehmiyê Bîlal li bihiştê û dogehê digere û li herdu aliyan jî bi gelek kesan re sohbet dike an jî li wan guhdarî dike û derheqên wan de ji zebanî û melayketan agahiyan werdigire.

Di vê romanê de sax û mirî, kesên dîroka kevin û kesên dema me... Herkes bûye leheng. Behsa herkesî hatiye kirin. Ji bilî kesên ku navên wan nehatine dayin, Abdullah Ocalan (Evdoyê Cergo-

Evdoyê Bizdo) û birayê wî yê ku diçe serdana wî û jê re dibêje “mêr be”, Mustafa Barzanî, Qasimlo, Şêx Mahmûdê Berzencî, Simko Axa, Kîrûsê ku wezîrê Împaratoriya Medan bû ku bi dû re bûbû sebaba jiholêrabûna vê împaratoriye, Celal Talabanî, Mesut Barzanî, Turgut Ozal (jê re dibêje Mîster Ozal), Îsmet İnönü (jê re dibêje rovî, dibêje Îsmetê Qer), Saîd Nursî, Ahmet Zekî Okcuoglu (Ahmedê Zirko), Şex Adî, Îsmail Beşikçi û heta bi awayekî gelekî eşkere û heyranbûyîneke weha ku hişê mirov qet nagihêjê Hesênê Metêyê nivîskar û berhemên wî û Lokman Polat bi xwe, Mehmet Emîn Bozarslan (şîrkê Ahmedê Xanî. r.137), romaneke Amin Maulof; “*diktatorên çep*” (r.117) wek Stalîn, Polpot, Mao, Kîm îl Sûng, Enwer Xoce; “*diktatorên mezin yên faşîst*” (r.117) wek Hîtler, Musolîni, Franko, Pînochet û navên gelek kesên din ku di salên heftêyî û heştêyî de serokatî an jî sekreteriya partiyên Kurdistan kiribûn û hê jî dijîn... Giş bi awayekî eşkere hatine diyarkirin, pesinandin, rexnekirin û tawanbarkirin.

Çi karê van navan gişan heye di vê romanê de? Ji ber ku hassasiyeta nivîskêr û dilsoziya wî ya di kurdewariyê de di hemû romanê de bi awayekî gelekî eşkere tê ravekirin, mirov bikaranîna van navên ku têkîliya wan bi Kurdistan re tune, fahm nake, heger mirov bi çavekî din lê nenihere.

Lewre, çerr ku mirov bi şuphe nêzîkî nivîsandinê bibe, rastî xwe eşkere dike. Ya ku ji hertiştî zêdetir balê dikişîne ew e ku Lokman Polat romana xwe weke mahkemeyekê bi kar tîne û yek bi yek serok û rêberên Kurdistan di wê mahkemeyê re derbas dike, muebberê dide hinan û hinan îdam dike û hinan xelat dike. Yanî, fikra yekalî û bê tolerans û demokrasî ! Tew îcar radibin û hin tevgerên Kurdistan bi bînpêkirina demokrasîyê ve tawanbar dikin ! Di vê romanê de « *diktatorê esil* » romannivîs bi xwe ye !

Fehmîyê Bilal li cennetê bi gellek kesên dîrokî yên navdar re dipeyve. Sohbetên wî yên bi Hasan Sabbah, Selahaddînê Eyyûbî, Celadet Bedirxan, Hz.Ibrahim Xelîl, Nemrut, Hz.Muhammed, Hz.Îsa, Hz.Musa, Zerdeşt Pêxember, Şêx Seîd, Ahmedê Xanî û bi kesên din re, ji romanekê bêhtir wek roportajên rojnameyan hatine nivîsandin û balkêş e ku di wan de bi piranî pirs û bersiv hene û ev hemû pirs jî sîrf ji bo diyarkirina fikirên nivîskêr hatine bikaranîn.

Wek mînak: Fehmîyê Bilal piştî sohbetê li ser siyaset û civata kurdî, ji Ahmedê Xanî dipirse:

“tu kovar û rojnameyên Kurdistan çawa dinirxîni?” (r.150)

Ev pirs bi tenê dikare ji nivîskarê romanê bê pirsîn; lê dîsa jî Xanî bersiveke dûdirêj dide. Elbet, hemû fikrên wî, yên Lokman Polat in. Fehmîyê Bilal li ser bersiva wî dîsa bi eynî awayî dibêje:

“ji bo van bersivên te gelekî spas dikim” (r.152)

Mirov li vê hevokê ecêbmayî dimîne. Bi temamî kiriye wek hevpeyvîneke weha ku ji bo kovarek an jî rojnameyekê hatiye kirin.

Ecêbiyeke din: Bi dû gelek pirs û bersivên siyasî re vê carê Ahmedê Xanî dipirse:

“... te rewşa Kurdistan ya civakî û siyasî, fikr û ramanên wan bi şeweyeke teorîk û felsefî şîrove kir. Niha em dev ji van tiştan berdin, bên ser edebiyatê. Ez meraq dikim gelo rewşa romana kurdî çawan e?” (r.160)

Elbet ev pirs Xanî jî dîsa ji aliyê Lokman Polat û ji devê Fehmîyê Bilal tê bersivandin.

Bi dû vê pirsê re, Ahmedê Xanî peyveke gelekî xweş dike.

“Yezdanê mezin ferman derxistiye, kîjan nivîskarê kurd ku bi kurdî roman binivîse, gunehê wî yê kaînatê çî dibe bila bibe, tê bexşandin û ew dibe cennetî.” (r.161)

Elbet her romannivîs nikare têkeve cennetê. Lokman Polat bi xwe jî dipirse:

“... ji bo ku bê zanîn bê ew kes romannivîser e û berhema wî jî roman e, pîvan dê çibe?” (r.161)

Belê, pîvan dê çî be?...

Em îro di sala 2010’an de dijîn. Romana dinyayê pîvanên xwe berî niha bi 300 salî danîne û tewêdî li ser wan pîvanan pîvanine nû ava dike.

Ji romannivîsê me Kurdistan pê ve herkes bi van pîvanan dizane.

4.

Di romanê de ji bilî şayesa hûriyan û ya bexçeyê cenneta Hesên Sabbah pê ve şayes tune ye. Diyar e ku ew jî ji hin pirtûkên din hatiye girtin, lewre danberheva vê romanê ya bi « Dagin şeyhi Hasan Sabbah » yan jî bi « Alamut Kalesi » re, dê nivîsê jî mijara xwe bi dût bixe. Ev herdu pirtûkên ku me navên wan dan jî berî çapkirina romanê derketibûn û bi ihtimaleke mezin Lokman Polat jî ew xwendine. Lê kêmaniya vê romanê ya herî mezin ew e ku lehengê xwe yê sereke jî neşayesandiyê. Bi tenê di rûpela 40'î de em di hevokekê de hîn dibin ku berçavka Fehmî heye, lê bi dût re weke nivîskêr, em jî wê berçavkê jî bîr dikin.

Tevgerên kesan di vê romanê de qet nîn in. Di vegotina bûyeran de jî zimanekî gelekî xerab hatiye bikaranîn. Tew psîkolojiya lehengan, qet tune ye. Gava behsa bûyera ku Fehmiyê Bîlal dixwaze xwe bikuje dike, weha dibêje:

“Fehmî li Darahanê du sal ma û paşê kete depresyonê xwaste xwe bikuje.” (r.39)

Di romanê de mirov behsa depresyona lehengan dike, lê ne bi awayê ku hema navê wê bide, bibêje “depresyon” û xwe jî zehmetiyê xelas bike. Xurtbûna nivîskêr ew e ku behsa rewşa lehengên xwe ya depresîfîyê bike. Mirov romanê weha nanivîsîne. Êdî herkes bi vêya dizane.

Lokman Polat jî bo Fehmiyê Bîlalê Licî hey peyva “Fîlozof” bi kar aniyê û ev nav li romana xwe jî kiriye. Erê, Fehmiyê Bîlal jî kesekî xwende û zane ye û weke nivîskarê romanê, civaka xwe baş nas dike û li ser rewşa gelê wî, dilê wî gelekî diêşe; lê ya rastî, di 163 rûpelên vê romanê de tu felsefeya Fehmiyê Bîlal an jî Fîlozof Fehmî naxuye. Mirov bi navê fîlozof nabe “fîlozof.”

Di vê romanê de herkes bi hertiştî dizane û dinirxîne, lê Xwedayê Tealayê ku bi hertiştî dizane (di Qur’ana Pîroz û hemû pirtûkên din yê li ser Xwedê de weha dinivîsîne) nizane bê Fehmiyê Bîlal jî bo çi dixwaze bi wî re bipeyive û meraq dike. (r.44)

Di romanê de ji bilî bûyera ku Fehmiyê Bîlal dixwaze xwe bikuje û bûyerên ku tên serê herdu keçikên ku li bihuştê jî wî re behsa serboriyên xwe dikin pê ve bûyerên balkêş tunene. Yê din giş jî dîrokê hatine stendin.

Kurdiya romanê jî gelekî xerabe ye. Lokman Polat guh nedaye zagonên gramerê û rastnivîsandina hin peyvên ku edî baş bi cih bûne. Beyî ku mirov zêde behsa vê mijarê bike, divê bi tenê çend mînakên ji romanê bide.

“Ew sê ziman dizanîbû” (r.8)

Divê weha bûya: “Wî bi sê zimanan dizanî.” (an jî ... « zanîbû »)

“(…) ji Licê heyeteke rûspiyan çûn pêşiya wî.” (r.12)

Divê weha bûya: “(…) ji Liceyê heyeteke rîspiyan çû pêşiya wî.” Heke ne weha be, wateya peyvê “rûreş” û “rûspî” divê di ferhengên de jî nû ve werin saz kirin.

Gelek caran gotiyê “çûndin” (r.12 û 17), lê ew “çûyin” e.

Nivîskar di rastnivîsandina navên kesan de jî dudil e. Navê birayê Şex Seîd, Şex Ebdurrahîm e an Şex Evdirrehîm e, nediyar e. Herdu awa jî hatine bikaranîn.

Nivîskar bi tewangan jî nizane. Hey çewt bi kar tîne.

“ketina nav bajar gelek zehmet e.” “(…) avê li ser bajar bibirin” (r.19)

Divê weha be: “ketina nav bajêr...” û “... ser bajêr...” (an jî « ... ser bajarî... »)

“destê kî û cêva kî” divê bibe “destê kê û bêrika kê”(r.54)

“mejiyê kî” (r.51) divê bibe “mejiyê kê.”

Peyvên mîna “damle” “ablûqe” (r.19) “destê kî cêva kî de ye”(r.54) ne bi kurdî ne.

“zeftkirin” û *“ziftkirin”* gelekî tev li hev kirine ku alaqeya wan bi hev tune ye. (r.18 û 22)

Lêkera “lihevkirin” her wek “bihevkirin” hatiye nivîsandin.

“em dikarin bi Fransiyan re bi hev bikin” (r.20)

“welhasil Kurdan bi hevûdu nedikir.” (r.37)

“wî û Fehmî bi hevûdu nedikirin.” (r.65)

Di kurdî de rêzkirina peyvan ya di hevokan de heye. Lokman Polat guh nedaye vêya jî.

“Dixwaze ku xwe dîsa biavêje nav avê...” (r.40) Mirov dibêje qey berê jî xwe avêtiye avê, lê tişteki weha di romanê de nîne.

Divê weha bûya: “Dîsa dixwaze ku xwe biavêje nav avê...” Ji ber ku berê jî xwastiye.

“Şemsî Westa” (r.41)

Divê bibe “Şemsî Hoste,” lewre di kurdî de « westa » tê wateyeke din.

“(…) ji Şêx Melîk re şîretan dike.” (r.41)

Di kurdî de şîret ji hinan re nayên kirin, lê şîret li hinan tên kirin. Divê weha be: “(…) şîretan li Şêx Melîkî dike.”

“çû ser heqîya xwe, mir e.” (r.42)

Di kurdî de mirov yan diçe ser heqîya xwe yan jî dimire. Peyva “mir e” bi kîjan hişmendiyê li gelek deverên romanê yên din jî weha hatiye nivîsîn, mirov fahm nake.

Zilamê ku bi herkesî re bipeyive, qey dê xwe bigihîne Xwedê Teala jî. Fehmî ji Xwedê re weha dibêje:

“Neteweyên herî xidar û barbar te kire belayê serê Kurdan.” (r.44)

Kê kî kiriye bela, nayê fahmkirin. Ji ber ku hayê Lokman Polat jê tuneye ku di kurdî de du komên cînavkan hene û nizane bê mirov kîjan koma cînavkan di kîjan forma lêkeran de bi kar tîne, gelek çewtiyên weha kirine. Ji xwe m qet pêwîst nabînin ku behsa ergatîfa vê hevokê û hevokên din bikin, lewre Lokman Polat bi ergatîfê nizane.

Divê mirov bizani bê bîhnok (vîrgul) di ku de tê bikaranîn. Divê ev hevok bi kurdî weha be: “Neteweyên herî xedar û hov, te ew li serê Kurdan kirin bela.”

An jî “Neteweyên herî xedar û hov tu li serê Kurdan kirî bela.”

Ji ber ku bi awayê rêzimanî herdu jî rast in û herdu wate jî dikarin ji vê hevoka Lokman Polat bînin girtin.

“Ew dizanîbû ...” (r.76)

Ji ber heman problema bikaranîna cînavkan, divê bibe “wî dizanî.”

“Yezdan min efû kir.” (r.91) Kî kê efû dike? Ev jî ne diyar e.

Divê bibe “Yezdên ez efû kirim.” An jî “min Yezdan efû kir.”

“min hêj te (...) negerandîye.” (r.122)

Dîsa problema cînavkan û ergatîfê. Divê bibe “min hêj tu (...) negerandîyî.”

“(…) te cennetê dît. Li wir cihê îstireheta te ya ebedî ye.” (r.48)

“cennet” (di rûpela 77’an de du caran “cînet” hatiye nivîsandin) peyveke erebî ye û kurdiya wê “bihuşt” e jî kurd giş vê peyvê fahm dikin û bi kar tînin, ji ber wê, bikaranîna wê ne pirsgirêk e; lê belê di vê hevokê de divê neyê tewandin. Ji ber ku di dema bihurî ya lêkeran de, bireser (objet) nayên tewandin. Lê Lokman Polat ew li gelek deveran tewandine.

“li wir” çewt hatiye bikaranîn, lê her ku ji bo heman mahneyê hatiye vegotin, “li wir” hatiye bikaranîn. Divê weha be: “(…) te cennet dît. Wira (an jî “ew der”) cihê îstireheta te ya ebedî ye...”

“pê re diaxifiya” (r.53)

Ev çewtî jî gelekî hatiye kirin. Divê weha be: “pê re diaxifi.”

Di kurdî de cinsiyetên navan (sexisme) hene. Lokman Polat gişan çewt bi kar tîne û wan tev li hev dike. Di nav hemû Kurdistanê de bi tenê di devokê Diyarbekirê û hin deverên Batmanê de nêr û mêtiya navan tev li hev dibe.

“(…) *belayê serê Kurdan.*” (r.44).

“bela” mê ye, divê bibe “belaya serê Kurdan”.

“*dikanê terzî*”

Divê “dikana terziyî” bûya. “dikan” jî mê ye û “terzî” jî divê bê tewandin, lê di tewanga navên nêr de mirov dikare bêtir bêhnfireh be, lewre awayê bikaranîna wî bi sînora e. (r.41)

Peyva “*neyse*” gelekî hatiye bikaranîn ku ew jî ne bi kurdî ye.

“*ev sîtema te li cî bû (…)*” (r.77)

Kesên ku ji kurdî pê ve bi zimanekî din nizanin, nikarin vê hevokê fahm bikin. Ji ber ku ew ne bi kurdî ye. « li cî bû », yanî çi ? Yanî bi tirkî « bu sitemin yerindeydi » (Yerinde bir sitem).

“*ev tiştên ku min behs kire (…)*” (r.43) û “*ji hev re astengiyan derdixistin.*”(r.37) û “*heger te dewletek kurdî ava bikirana (…)*” (r.104)

Di zimanê kurdî de, di dema çûyî ya lêkeran de hingî gellek nivîskar vê çewtiyê dikin, edî mirov ji ber xwe dikeve şikê. Di dema çûyî ya lêkeran de pirhejmariya lêkeran (verbe-fîl) li gora bireseran (objekt-nesne) diyar dibe û ew jî dikeve nava zagonên ergatîfê.

Divê ew hevok weha bin: “ ev tiştên ku min behs kirin ” û “ji hev re astengî derdixistin” û “heger te dewleteke kurdî ava bikiraya...”

“*tu û yên wek te divê ji xwe şerm bikin.*” (r.107) Di kurdî de mirov ji xwe şerm nake, lê ji ber xwe şerm dike. (bi tirkî : kendinizden utanmalısınız !)

Divê weha be “(…) ji ber xwe şerm bikin.”

“(…) *maçîkirina ala dewleta komarê bû.*” (r.108) An divê “... maçîkirina ala dewleta tirkî bû” be an jî “... *maçîkirina ala komara tirkî bû.*” Ji ber ku ew al ne ya komarê ye, lê belê ya Komara Tirkiyeyê ye.

“(…) *mirov nikarîbû bi du çavan lê binere.*”(r.127)

Mirov serê xwe çî qasî ji bo têgihîştin û rastkirina vê hevokê biêşanîne jî nikare fahm bike bê nivîskar bi vê hevokê dixwaze çî bibêje!

5.

Gelek handîqapên tevn û hûnandina romana Lokman Polat hene. Di serboriya keçika duyem ya cennetê de gava ku keçik dibêje “ez bi destê birayê xwe hatim kuştin” (r.92) Fehmiyê Bîlal dipirse bê ka çima hatiye kuştin jî nivîskar ji bîr dike ku bersivê jî devê keçikê bide û bi vî awayî, elbet, Fehmî jî pirsê xwe ji bîr dike. Lê xwendevan van tiştan ji bîr nakin. Divê mirov hebeke din bala xwe bide karê xwe.

Di bûyera keçika yekem de jî, kaloyê ku keçik bi awayekî birîndar ji mirinê xelas kiriye, ji wê re dibêje ku wî ji bo ku malbata wê pê nehise ku ji mirinê filitiye, hem ji bo wê û hem jî ji bo hezkiriyê wê û şivanê ku ew veşartine mezê kolane û termên yê din binax kirine. (r.90) Lê belê Lokman Polat ji bîr dike ku hayê kalo jê tune ye ku keçik ji aliyê malbata xwe ve hatiye birîndarkirin. Ji ber ku kalo berî wê weha dibêje:

“...*dengê teqêna çekan hate min. Karê min di bin barê etariyê de hêdî hêdî diçû, hetanî min xwe gîhand newalê gelek wext derbas bû. Ez hatim gihîştim newalê. Sê term li erdê bûn...*”(r.89)

Kalo çawa pê derxist ku malbata keçikê jî tev li van kuştinan bûye? Ji ber ku keçik hê nû hatiye ser hişê xwe û bi wî re dipeyve.

Seqetiyeke din jî di vê serboriyê de heye. Kalo termê hezkiriyê wê jî di rûpela 90'î de binax dike, lê hê rûpelek derbas bûye ku nivîskar dîsa xwe ji bîr dike û li bihuştê hezkiriyê keçikê weha gazindên xwe dike:

“ez ji bo te hatim kuştin. Te laşê min li erdê ji teyr û wariran re, ji gur û kûçikan re hêşt û tu çûy. We ji min re mezelek jî çênêkir...” (r.91)

Heke mirov di serboriyeke ewqasî kurt de van çewtiyên mezin bike, di romanê de dê hezar çewtiyan bike û hertiştî li bin guhê hev bixe. Ji xwe Lokman Polat jî weha dike.

Fehmî ji bo ku hevalê xwe yê ku em di derheqê wî de bi tenê dizanin ku navê wî Bavê Tûjo ye (di saxiya wî de demekê tê gotin ku di komîteya komeleyê de bi hev re xebitîne (r.9), lê behsa wî nabe; bi dû re jî li bihiştê tê gotin ku bi hev re dipeyivin (r.126), lê ji vê agahiyê pê ve behsa tiştêkî din nabe.) bibîne, diçe cenneta Hesên Sabbah. (r.80) Piştî ku Lokman Polat dikeve behsa Hesên Sabbah û çîroka wî ya ku di romanên bi navên “Alamut” û “Semerkand” de hatiye vegotin, Bavê Tûjoyê ku Fehmî dixwaze wî bibîne tê jibîrkirin.

Gava ku jê re behsa Keça Xezal ku Zîna Zêdan e dibe, Fehmî dixwaze wê jî bibîne. (r.93) Lê di vê rûpela ku “Destana Memê Alan” û “Mem û Zîna” Ahmedê Xanî bi şaşî tev li hev bûye de (ji ber ku herdu ne yek in), Fehmî û Lokman Polat ji ber ku behsa ramanên nivîskêr yên li ser vê berhemê dibe, Keça Xezal jî ji bîr dikin. Tê wê mahneyê ku Fehmî belasebeb diçe cenneta Hasan Sabbah û hayê wî jî ewqasî ji wêjeya kurdî nîne. An jî em weha fahm dikin.

Seqetiya herî girîng jî di vegera dinyayê ya Fehmiyê Bîlal û Şêx Seîd de derdikeve pêşberî mirov:

Lokman Polat li ser daxwaza çuyîna welêt ya Fehmiyê Bîlal, ji devê Xwedê weha dide gotin:

“hetanî niha tu kes venegeriyaye. Hele ji Kurdan yek ne tê de tu kes venegeriyaye.” (r.46)

Çawa “tu kes venegeriyaye” û bi dû re çawa dibe “yek ne tê de tu kes venegeriyaye,” mirov fahm nake. Piştî wê em ji Seyid Buharî hîn dibin ku ew kesê ku “yek ne tê de” tê behskirin, Şêx Seîd e û salê carekê bi icazeta Xwedê diçe dinyayê û li ser Kurdistanê digere û rewşa milletê xwe dibîne. (r.48) Lê romannivîs û Fehmî vê agahiyê ji bîr dikin û Fehmî dîsa di rûpela 51'ê de pirsra Şêx Seîdî ji Xwedê dike û dîsa heman bersivê distîne. Xwedê kir ku Xwedê ji wan re nabêje « Ma hûn gêj in qey !? Min hê sê rûpel berê ji we re got ! »

Em ji rûpela 52'an û bi şûn de jî baş dizanin ku Fehmî jî wê icazetê distîne û heta diçe dikeve mejiyê Seîd Elçî û Abdullah Ocalan jî. Ev jî tê wê mahneyê ku hayê wî ji rewşa welêt heye; lê belê Lokman Polat dîsa xwe ji bîr dike û di sohbeta Şêx Seîd û Fehmî de, pirseke weha di nav wan de derbas dibe ku ne hewce ye ku mirov tiştêkî li ser bibêje:

“Niha rewş çî ye? Kurd çî dikin, hê jî serhildanên wan dom dikin?” (r.106)

Digel ku bi icazeta taybetî vedigerrin nava milletê xwe jî, mirov dibêje qey di guhê gê de dijîn ! Gava Ahmedê Xanî behsa kurdên Swêdê dike, Fehmiyê ku hê nû ruhê wî ji Kurdistanê vegeriya dîsa xwe ji bîr dike û dipirse:

“Kurd çûne Swêdê jî? Di dema me de kurd li Swêdê tunebûn.”

Lê belê, Fehmiyê Bîlalê Licî, heta dawiya mahkemeya Abdullah Ocalan jî di nav Kurdan de digere û rewşa milletê xwe dibîne. Çawa ev hatiye jibîrkirin, ev çilo hûnandine? Mirov ancax dikare ewqasî xwe ji bîr bike û naif binivîsîne.

6.

Tebîetekî nivîskêr yê ecêb heye ku hin hevokên xwe, bi awayekî ku mirov aciz bike, dubare kirine.

“Ew sê ziman dizanîbû. Yanî bi kurdî, tirkî û fransî zanîbû.” (r.8)

“Şêx Seîd efendî wî kiribû katibê xwe (...) hertim bi wî dişewiriya.” Di hevoka piştî wê de dîsa dibêje “hinek kesên nezan (...) aciz bûbûn ku çima Şêx seîd wî kiriye katibê xwe û çima bi wî her tişt dişewire.” (r.8)

“Ji Şêxê Hezanê, Şêx Selîm re xeber şiyand (...)” paragrafa xwe bi vê hevokê temam dike û paragrafa din dîsa weha dest pê dike: “Xeberê ji Şêxê Hezanê re şiyandin.” (r.14)

“Şêx Seîd efendî ji bo ku nedixwast ku bûyerek çêbibe (...)” çar rêzik di binê wê de jî weha dibêje: “Şêx Seîd efendî nedixwast ku beriya newrozê bûyerek çêbibe.” (r.15)

“leşkerên wî yên ku derdora bajêr girtine (...)” (r.20) di heman paragrafê de xwe ji bîr dike ku bajar berê daye rapêçandin û weha dibêje: “leşkerên kurd, bajêr rapêçandin.” (r.21)

“Vêca şer di nav bajêr de dest pê kiribû” hevokekê dibêje û dîsa vedigere serî: “di nav bajêr de şerekî dijwar dest pê kiribû.” (r.21)

“Paşê di nav mala Bedirxaniyan de û mala Cemîlpaşa de nakokî derketin.... munaqaşayên fikrî dest pê kir... welhasil Kurdan bi hevûdu nedikir. Ji hev re astengiyan derdixistin... Kurd ji hev perçe dibûn. Mala Bedirxaniyan û mala Cemîlpaşa ji hev cuda bûbûn. Wan li hevdu rexne digirt. Demek şûn de mala Bedirxaniyan dev ji siyasetê berdan.” (r.37) Ev paragraf hemû ji dubarekirinê pêk hatiye.

“Lê wî dit ku sazûmana kemalîst çawan civaka kurd ji eslê xwe bi dûr xistiye.” Hevoka dû wê ev e: “rejîma kemalîst a zalim bi çova zorê zoreke wisa dabû ser gel ku însan ji eslê xwe bi dûr ketibûn.” (r.39)

“rojê Fehmî diçe ber çem ku xwe biavêje çem û li jiyana xwe dawî bîne.” Hevoka pey wê jî ev e: “diçe ber çem... dixwaze xwe biavêje nava ava ku...” (r.40)

“li ser fermana Yezdan, melayket ruhê wî tînin xwarê.” Beyî ku navbirê bidiyê, hevoka di pey wê re jî heman tiştî radigihîne. “Ruhê wî tê xwarê.” (r.53)

Dubarekirina heman fikran ya di vegotinan de weke nîşana qelsiya zimanê nivîskêr tê nirxandin. Romannivîsê kurd jî di vê romanê de him bûyer û fikir gellekî dubare kirine û him jî ji derfetên zimanê xwe bêpar tevgerriyaye. Navên heman lehengên xwe li pey hev ewqasî dubare kirine ku mirov dibêje qey hayê wî ji cînavkan tune ye. Wek mînak: di rûpela 5’an de tam 12 caran gotiye “Eliye Hewro”; di rûpela 27’an de di şeş hevokên paragrafa duyem de çar caran gotiye Hesen Keya. Yanî, gellekî bi nezanîni hatiye nivîsandin ku mirov bi zorê dixwîne.

Peyvên yek mahne li pey hev rêzkirine:

“binê xetê di bin destê Fransiyayê de bû. Perçeya biçûk a Kurdistanê di bin destê Fransiyayê de mabû. Di wê demê de Sûriyê bi temamî di bin kontrola Fransayê de bû.” (r.31)

“efûyeke giştî bû, efûyeke umûmî bû.” (r.38)

“gelekê wan di bin xetê de, di Kurdistana başûrê biçûk de û di Suriyê de man.” (r.38)

“... ji bo ku cennetî bûye diçe ezmanan. Yanê ew heft qat diçe jor, heft qat naçe jêr, naçe cehennemê. Li gorê baweriya olî dibêjin cennet heft qat li jor e û cehennem jî heft qat li jêr, li binê erdê ye. Fehmî diçe jor...” (r.44)

Dialogueke wî û Xwedê heye ku ji bo romana kurdî gelekî trajî-komîk e. Fehmiyê filozof li ser pêşeroja Kurdan pirsan ji Xwedê dike, lê ji dêleva Xwedê, Lokman Polat dibersivîne. An jî Xwedayê mezin jî wek nivîskarê romanê li bûyeran dinihere. Divê hişê Xwedê ji yê me hebekî din firehtir be û ew weke me ji Kurdistanê re nabêje “welêt” û nabêje “tu dê biçî di welêt de çi bikî?” (r.50) Xwedê Teala tu carî weke me li bûyeran nanihere, wan bi şeweya me nanirxîne û weha nabêje:

“Hejmara hevalbendên dagirkeran, yanî hejmara cerdewanan ji yê şerkerê azadîxwaz pirtir e... li axa û beglerên xwe binere, hemû bûne hevkarên dewletê.” (r.50)

Yê ku van peyvan dike û dibêje “dagirker û cerdewan û şerkerê azadîxwaz û hevkarên dewletê” Xwedê Teala bi xwe ye! Mirov dibêje qey ew jî kurd e. Gava Xwedayê wan weha bipeyive, elbet Hz.Muhammed û Hz.Musa û Hz. Îsa dê di vê romanê de ji wî beradayîtir bipeyivin.

Di romanê de gelek dialog hatine bikaranîn. Hema mirov dikare bibêje ku piştî rûpela 43’an hemû diyalog, yê cennetê ne. Lê di nava dîialogan de qet navbir tune ye û hema carekê be jî bi şaşî behsa awayê xebirdanên wan lehengan nebûye. Lokman Polat di vê romana xwe de ne û ne jî ji hoker bi qasî ku pêwîst in bi kar anîne. Lê belê ev herdu jî ji bo baştir ravekirina bûyer û kes û dîialogan, pêdiviyên romanekê ne.

Hingî ewqasî tev li hev bûye, carinan mirov nizane bê kîjan ji kesan dipeyive. Ji ber ku giş weke hev dipeyivin. Wek mînak Ahmedê Xanî û Fehmiyê Bîlal û Lokman Polat, gava behsa siyaseta kurdî, edebiyata kurdî û civata Kurdistan dibe, balkêş e, bi yek şeweyê û bi yek helwestê dipeyivin.

Di nêzîkedayina bûyer û lehengan de jî, Lokman Polat nizane bê divê helwesteke bi çi rengî bigire û nizane bê ew ê li kî derê bûyeran bisekine. Mîna Kurdekî li bûyeran nihêriye, lê divê mîna romannivîsekî binihêriyaya.

Li ser serhildana Şêx Seîd weha dibêje:

“lê çi heyf ku mahkuman daxwaza teslîmbûnê qebûl nekirin... serbazê tirk jî ji xwe dixwaze provakasyonê çêbike.” (r.15)

“bi sedan canfedayiyên bênav bêşdarî nav hêza Şêx Seîd dibin.” (r.18)

“lê çi heyf ku ev pêşniyazên Fehmiyê Bîlal nedihat qebûlkin.” (r.20)

Hin bûyerên dîroka Kurdistan, bi zimanê TRT, Programa bi navê “Anadoludan Gorunum” û Nûçeyên Med TV û Ozgur Halk û Serxwebûnê hatine ragihandin.

*“gelek esker û zabitên tirkan **kuştin**, hinek ji nav wan jî **şehîd ketin**.”*(r.22)

*“Hesen Keya... li dij askerên **dagirker, taktîkên gerilla** bi kar dianiya.”* (r.25)

*“ew û hevalên wî bi mêranî hatin **kuştin** û ketin nava **karwanê şehîdên Kurdistanê**.”* (r.28)

*“Saîd Elçî çû başûr û li wir bi **leyistikeke tarî** hate **kuştin**. Paşe Dr. Şivan jî hate **kuştin**. Herdu Saîd bi **komployê hatibûn kuştin**”* (r.54)

*“serokê serhildêrên 29’an jî bi **komployeke navnetewî** hate **girtin**...”* (r.107)

7.

Ji bilî serboriya keçikên bihiştê û ceribandina xwekuştina Fehmiyê Bîlal, di romanê de hêleke din jî heye ku mirov dikare bipesinîne. Fantaziya Lokman Polat ku Fehmiyê Bîlal, li cennetê û cehennemê bigerîne û bi gelek kesan re bide peyvandin. Di edebiyata dinyayê de Dante bi *Komedyaya Xwedayî* hîmê vê fantazyê danîbû. Piştî wî Goethe bi Faust ew hebekî guherandibû û nûjenî lê kiribû. Di nav Kurdistan de Osman Sebrî bi çîroka xwe ya bi navê *Li Goristana Amedê* ku 1933’an de nivîsandiyê û di hejmara 21’ê ya *Hawarê* de daye çapkirin, vê teknîkê bi kar tîne. Di wê çîroka Osman Sebrî de ev fantazî bi awayekî gelekî xurt hatiye bikaranîn. Bi gotineke din mirov dikare bibêje ku ev teknîk, ji bo Kurdistan jî û ji bo neteweyên din jî ne tiştêkî nû ye. Lê di vê berhema Lokman Polat de di nav bûyerên ji hev belawela û dialog û nirxandinên ecêb de wenda bûye û çûye.

Di kurdî de ji bilî Osman Sebrî, di pirtûkeke din (navê nivîskarê wê nayê bîra min) bi navê “Serok û Sokrates” de jî teknîkeke weha, lê li ser pirs û bersivan hatibû bikaranîn hebû. Di vê pirtûka dawîn de jî nivîskêr Abdullah Ocalan kiribû hevalê Sokrates. *“Fîlozof”* Fehmî çawa Sokrates û

filozofên din û ilhes jî romannivîsên mezin yên ku niha ew jî li cennetê ne nedîtine, mirov fahm nake!
Heyf!

8.

Ev nivîs sala 2001'ê hate nivîsandin. Ev nêzî deh salan e ku min digot pêdivî pê tuneke ku were çapkirin. Lê, ez dibînim ku hin tişt divê eşkeretir werin gotin. Di nivîsê de, bi tenê ji bo çapkirina wê ya nuha hin diyardeyên demê hatine guhertin.

Piştî ku min li ser daxwaza nivîskêr romana wî ya bi navê *Kewa Marî* jî xwend û min dît ku ew jî kêr zêde bi heman awayî hatiye nivîsandin, ez dikarim bêyî dudilîyê bibêjim heyfa wê demê ku min li xwendina wan romanana daye. Piştî wan herdu romanana, min nema berê xwe da pirtûkên Lokman Polat. Ji ber wê ye ku nivîsandin û çapkirina wê nivîsê jî weke mecbûriyeteke li hember wêjeya kurdî li ser milê min bû. Niyeta min hebû ku min di pirtûka xwe de cih bidaya wê, lê, şert û mercan ez mecbûr kirim ku berê çapa pirtûkê, hin rastiyan eşkere bikim, da ku xelk bizanin...